Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1241 22-Çile-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Teknolojiya şarezayên zarokan ber bi windabûnê ve dibe



Navenda Nûçeyan/Qamişlo

**Di serdema niha de zarok bi rêjeyeke zêde teknolojiyayê bi kar tînin, ev yek dibe sedema lewazbûna têkiliyên wan ên civakî û çêbûna nexweşiyên piskolojîk. Ji ber wê girînge ku dayîk û bav her roj demekê bi zarokên xwe re derbas bikin, herwiha bi lîstokan zanyarî û zanebûna wan pêş bixin.**

Di serdema îro de zarok piraniya demên xwe bi teknolojiyayê re derbas dikin û piraniya demên xwe bi tenê ne, ji ber vê yekê tevlîbûna wan ji malbat û civakê re kêm e. Eger zarok di warê pêwendiyên civakî de şarezayiyên kêm bin, dema ku ew mezin bibin wê peywendiyên wan yên civakî bi xelkê re lawaz bin, ev jî zirarê dide jiyan û ew pîşeya ku lê kar bikin. Piraniya teknolojiyên ku zarok bikar tînin jî mîna lîstikên vîdyoyî, telefonên zîrek, televîzyon, kombiyuter, tablet, înternet, torên civakî, xizmetguzariyên axavtinê, amûrên hejmartinê û hwd…

### Zarok bi rêjeyeke zêde teknolojiyayê bi kar tînin

Di serdema niha de, zarok bi rêjeyeke zêde teknolojiyayê bi kar tînin. Piraniya kompaniyên warê teknolojiyê ji bo zarokan çendîn amûrên elektronîkî berhem anîne û hejmareke zêde ji zarokan pê ve mijûl dibin. Lîstikên ku nifşên îro pê kêfxweşin weke PlayStation, Rollbox, Overcook, Minecraft, Angry Bird, Bobcî û gelek lîstikên din hene.

### Pirsgirêkên ku zarok ji ber bikaranîna zêde ya teknolojiyayê rûbirûyî wê tên

Bikaranîna zêde ya teknolojiyayê ji aliyê zarokan ve, zarokan ji fêrbûna hest û hezkirina derdorê dûr dixe. Serdema ku em niha tê de dijîn, serdema teknolojî û geşekirinê ye, nabe malbat di pêşketina bilez a teknolojiyê de kêm zanyarî û kêm ezmûn be. Nehişyarnebûna dayîk û bavan ji teknolojiyê re, rola dayîk û bavê kêm dike.

Zêde bikaranîna teknolojiyayê dibe sedem ku zarok tenê dixwaze dema xwe bi teknolojî û amûrên zîrek re derbas bike, ev yek jî bandorê li ser peywendiyên civakî dike, herwiha heza zarokan ji bo tevlîbûna derdorê namîne.

Di heman demê de zêde bikaranîna teknolojiyayê dibe sedem ku têkiliya zarok bi zarokan re kêm be, herwiha zarok ji derketina derve û lîstina li tax û kolanan xwe dûr bigirin. Zarok piraniya demên xwe bi înternêt û lîstikên vîdeoyî re derbas dikin, herwiha bûne qurbaniyên vê yekê, di heman demê de ji ber kontrolkirina wan ji aliyê înternetê ve rastî zirarê hatine. Di encama van tiştan de bi zarokan re bêzarbûn û nexweşiyên piskolojîk çê dibe.

Zarok bi sedema bikaranîna zêde ji teknolojiyayê demeke zêde rûdinên û tevgereke kêm dikin, lewra qelewbûn li cem zarokan pêk tê, di heman demê de xwarinên bilez dixwin ev jî dibe sedema qelewbûna wan.

Qelewî jî dibe sedama nexweşiyên wek sistiya dil û nesaxiya şekir jî li pey xwe tîne û eger ev nexweşî rastî zarokan bên, derbaskirina wan gelek zehmet e.

### Girînge dayîk û bav zarokên xwe ji zêde bikaranîna teknolojiyayê dûr bixin

Pêwîst e dayîk û bav bi lîstin di gel zarokên xwe dem derbas bikin, da ku bi berdewamiya rojê, ji mêzekirina televîziyon û lîstin bi lîstikên vîdyoyî re biparêzin. Yek ji sedemên sereke ku zarok zêde teknolojiya bikar tîne, ew vedigere li ser mijûlbûna dayîk û bavan. Divê her kêlî dayik û bav li zarokên xwe agahdar bin, wan di têkiliyên civakî de kur bikin, herwiha parastina wan ji teknolojiyayê û tiştên bê sûd bikin, pirogiramekî rojane ji zarokên xwe re ava bikin, zanebûn û hizkirina ji xwendinê li cem wan ava bikin. Tirsê nexin dilê wan û mîna hevalekî xwe bi wan re danûstendin bikin, da ku pêşeroja zarokan pêşerojeke ronî dagirtî zanist û zanebûn be.

# 2024 bû sala herî germ a hatiye pîvandin

Copernicus’ê ragihand ku sala 2024’an bû sala herî germ a hatiye pîvandin.

Bandora germahiya global her sal hîn zêde dibe. Li gorî qeyda meha Mijdarê ya derbasbûyî, bû Mijdara herî germ a duyemîn. Tê payin sala 2024 jî bibe sala herî germ. Ajansa Çavdêriya li Guhertina Avhewayê ya ser bi Yekîtiya Ewropayê (Copernicus) diyar kir ku germahiya Mijdara 2024’an li gorî rêjeya beriya serdema pîşesaziyê di ser 1,62 pileyî de bû. Alîkara Dîrektora Copernicusê Samantha Burgess got, “Li gorî daneyên Copernicusê yên têkildarî salê yên mehek beriya bidawîbûnê, 2024 wê bibe sala herî germ a di ser 1,5 pileyî re.”



Bi kamîreya Ronaz Silêman



## FERHENGA BIWÊJAN

**Ji meyweyan te tivir anî?**
- Ji waqas tiştên baş te ya herî xirab anî?

**Ji paş ve hanêmanê ji pêş ve korpoşmanê:**
- Berî ku mirov baş bibîne mirov dibêje qey baş e, lê pişt re dilê mirov jê sar dibe.

**Ji qelsemêran we ye laşê xweşmêran naêşe:**
- Yê qencî nekirî dibêje qey wisa hêsan e; yê tişt bi serê wî nehatîn nizane; yê pisgirêkên wî çênebûyîn nizane ka çiqas zehmet e.

**Kayê û dan tevlîhev dike:**
- Xirab dike; nezan e; nizane çi dike; nizane çi dibêje.

**Kaya kevin û nû dide bayê:**
- Mirovekî nezan e; her tiştî tevlîhev dike.

**Kumê xwe bi xweliyê ve daye sere xwe:**
- Ji ber nezanîna xwe zererê dibîne.

**Li ber bayê wî ketiye:**
- Bi wî hatiye xapandin; bê zanebûn hevaltiya wî dike.

**Ma ezê ji kîsî xwe bixwim şîretan li te bikim:**
- Ma her tim ezê ji te re bêjim wiha bike; ma çima tişt nayên bîra te?

**Mirovekî nexeritandî ye:**
- Bê perwerde ye; nizane ka çi dibêje; nizane ka çi dike.

**Mitirbê zir e ne li defê ye ne li zirnê ye:**
- Xwe zana dibîne lê bi kêrî tiştekî jî nayê.

**Pêşiya xwe nabîne:**
- Ne jîr e; haya wî pir ji dinyayê nîne; xeşîm e.

**Reş û spî ji hev dernaxe:**
- Nezan e.

**Serê ben ketiye destê nezanan:**
- Çawa ku em dixwazin karê me nameşe; mirovên nezan pêşengiya me dikin. (23)

Serê ben di destê nezanan de ye:
- Bi heman wateyê.

**Ser re borî:**
- Nizanî; tê dernexist; pê dernexist.

**Serê xwe kiriye cirnekî vala:**
- Haya wî ji dinyayê nîne; bi tiştên beredayî ve mijûl dibe; nizane ka çi dike.

**Serê min bi ard dîtiye jê we ye qey ez qeraş im:**
- Xeşîm e; bi tiştên li ber çavan xapiyaye.

**Tûrikê wî vala ye:**
- Haya wî ji tiştekî nîne; tiştekî nizane.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## ‘Gel bi Rêveberiya Xweser re berxwedaniyeke dîrokî didin meşandin’



Hevserokê berê yê Meclisa Cîbicîkar a kantona Cizîrê, Teleet Yûnis salvegera damezirandina Rêveberiya Xweser bibîr xist û da zanîn ku “Îro gel bi hemû pêkhateyên xwe ve bi Rêveberiya Xweser re berxwedaniyeke dîrokî dikin.”R-3

## ‘Hebûna jinê di veguherîna siyasî de’



Hevseroka Meclisa Sûriya Demokratîk Leyla Qereman tekez kir ku bi yekbûna dengê jina kurd, ereb, durzî, xiristiyanî, suryanî û ermenî wê Sûriyeke nû û demokratîk bi dest bixin.R-2

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye

Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1241 22-Çile-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# BERXWEDANA EFRÎNÊ MOHRA XWE LI DÎROKA MIROVAHIYÊ DA

7 sal li ser êrişên dagirkeriya Tirkiyê li ser herêma Efrînê warê zeytûnê re derbas bûn û hîn jî li Efrînê li ber çavê cîhanê sûcên dijmirovî pêk tên. Berxwedana Serdemê ya ku 58 rojan hat meşandin muhra xwe li dîroka berxwedaniya gelan xist. Têkoşîna gelê berxwedêr wê heyanî rizgarkirina Efrînê û bidawîkirina dagirkeriyê bidome.R-4




## Bavê Teyar bû dilsozê gelê xwe



Lîstikvanê kurd ê şanoyê Cuma Xelîl Îbrahîm bi navê din(Bavê Teyar) ê ku di êrişa dewleta Tirk ya li ser Bendava Tişrînê de bi giranî birîndar bibû, jiyana xwe ji dest da. Bavê Teyar di hevpeyvîna xwe ya berya êrişê de gotibû ”Em ji mirinê natirsin, em ê heta dawiyê axa xwe biparêzin.R-7

## ‘Em ê bi rihê Nazim û Cîhan bibin dengê QSD û YPJ’ê’



Rojnamevan Ciwana Cuma ya ku êrişên dagirkeriyê û berxwedana gel a Bendava Tişrînê ji nêz ve dişopîne anî ziman ku dê berxwedaniya gel a bêhempa dagirkeriyê têk bibe û wiha got “ Ger Bendava Tişrînê bê armanckirin dê karîsetekî mezin a mirovî rû bide.”R-3

## Zêdetirî 30 hezar malbatên Efrîn û Şehbayê li herêma Rêveberiya Xweser bi cih bûne



Hevserokê Ofîsa Karûbarên Penaber û Koçberan Şêxmûs Ehmed da zanîn ku zêdetirî 30 hezar malbatên Efrîn û Şehbayê û 7 hezar kes ji deverên din yên Sûriyê berê xwe dan herêma Rêveberiya Xweser û got, “Neteweyên Yekbûyî li hember rewşa koçberan bi erkên xwe ranebûn.”R-6

Sozdar Cîhad jineke kedkar bû
Nehîr pale R-2


Bavê Teyar: “Em ji we natirsin”
Farûk Sakik R-5

Divê di yekîtiya netewî de bê israr kirin
Zekî Bedran R-5


Gelo Jîriya Çêkirî dê helbestan jî binivîse?
Kemal Necim R-7

# ‘Ji bo parastina hebûna jinan em ê xebatên xwe xurtir bikin’

Hevseroka Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya bajarê Reqayê Zelîxa Ebdê destnîşan kir ku Sûriyê di nava xwe de pêkhate û olên cuda dihewîne û îdyolojiya ku li Şamê tê meşandin xizmeta Sûriya siberojê nake.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Di demeke hesas de ku Sûriyê bi gitşî tê de derbas dibe, piştî rûxandina rêjîma Bees û hatina HTŞ ser desthilatdariya Şamê, xeteriyeke ser hebûna jinan çêdibe ji ber siyaseta HTŞ ya dûrxistina jinan ji qadên jiyanî. Giringe ku çalakî û komxebatên banga hevgirtin û yekbûna jinan bê li dar xistin, da ku roleke wan jî hebe di avakirina Sûriyeke demokratîk pirrengî ne navendî.

Di komxebata jinan ku li Hesekê hatibû lidarxistin, hevseroka Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya bajarê Reqayê Zelîxa Ebdê ji rojnameya me re axivîn.

Hevseroka Desteya Perwerde û Fêrkirinê Zelîxa Ebdê diyar kir ku di vê dema hestiyar ku Sûriyê tê de derbas dibe pêwîstî heye ku çalakî û komxebatên jinan bên lidarxistin û wiha domand: “Da ku em hevgirtina hewildanên hemû jinan ava bikin, ji bo avakirina Sûriyeke demokratîk nenavendî. Piştî gihaştina HTŞ ser hikumeta Şamê, gelek daxuyniyên ku ne li gorî berjewendiyên gelê Sûriyê bi taybet yên jinan tê derxistin.”

**‘Bi berxwedanî û têkoşînê em gihşatin vê qonaxê’**

Zelîxe Ebdê wiha pê de çû: “Jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, berxwedanî û têkoşîneke pir mezin dan meşandin heta gihaştin vê ast û qûnaxê, em naxwazin ew jiyana tarî li me vegere, tenê bi karên malê sînordar be û ji mafên xwe dihat dûrxistin. Ancex em bi komxebat, çalakî û vekirina riyan ji bo tevahî jinên cîhanê û bi taybet jinên hundirê Sûriyê, hewildan bê kirin di riya Meclisa Jin a Sûriyê, ji bo yekbûna refên jinan ava bikin û hevgirtinê xurt bikin.”

**‘Metrsî li ser siberoja jinan heye’**

Zelîxe Ebdê Bal kişand ser daxuyaniyên Ayşe El-Dibis û hin perspektîfên ji Şamê bi taybet piştî serdana wezîreya Elamaniya kir û wiha domand:“ Îdyolojiya ku wê bimeşînin di pêşerojê de hate xuyanî kirin. Em xeteriyê li ser gelê Sûriyê bi giştî û bi taybet pêşeroja jinan di hundirê Sûriyê de hîs dikin. Sûriya ji mûzayîka pêkhate û olên cuda pê tê, ev siyaset û îdyolojî xizmeta Sûriya pêşerojê nake. Em hemû daxuyaniyên ku Ayşe El-Dibis û daxyaniyên din yên Ebû Muhemed Colanî ku derbarê dûrxistina jinan di pêşerojê de derdikevin, şermezar dikin.

**‘Ji bo parastina hebûna jinan em ê xebatên xwe bihêztir bikin’**

Zelîxe Ebdê destnîşan kir ku wê hewildanên xwe berfireh bikin ji bo hişyarkirina jinan ji xeteriya tunebûn û dûrxistina ji qadên jiyanî û wiha berdewamî axaftina xwe kir:“ Em ê xebatên xwe berdewam bikin da ku bighêjin hemû jinên Sûriyê, heta bidestxistina hebûna me di destûra nû de, herwiha em bibin xwediyên çêkirina biryaran di Sûriyeya nû de. Em venegerin



demên kevin ku tenê kar û xebata di warê fêrkirin û perwerdê de an di cihên çandî de bikin. Daxwazên me ku jin jî karibe herêman îdare bike, di parlemantoyan de cihê xwe bigrin, di çêkirina birayran de be, di hemû warên jiyanê de, hem ser asta aborî hem xizmetguzarî û çandî û hwd..”

Di dawî de Zelîxe Ebdê wiha got:“Em weke jinên ji pêkhateyên Ereb li kêleka hêzên QSD sekinîn û em ê her dem bisekinin. Gelek jin jî ji herêma Reqayê tevlî QSD bûn, em daxwaz dikin ku di hundirê artêşa ku bê pêkanîn de jî hebûna jinan hebe û cihê xwe bigrin, da ku em parastina xwe û nasnameya xwe bikin, herwiha Sûriyeke demokratîk pirrengî nenavendî bê ava kirin.

# ‘Hebûna jinê di veguherîna siyasî de’

**Jîn Hisên/Qamişlo**

**Hevseroka Meclisa Sûriya Demokratîk Leyla Qereman tekez kir ku bi yekbûna dengê jina kurd, ereb, durzî, xiristiyanî, suryanî û ermenî wê Sûriyeke nû û demokratîk bi dest bixin.**



Piştî 50 salên tijî êş û azar ku gelê Sûriyê bi giştî kişand, rejîma Eseed di 8`ê meha Berfanbarê de hate rûxandin, êdî dîrokeke nû ji bo Sûriyê hate nivîsandin, derfeteke ku gelê Sûriyê bi hemû pêkhateyên wê bi demokratîk bi hev re jiyan bikin û di destûra Sûriyê de cih bigrin, bi taybet jî jina Sûrî ku di seranserî 50`î sala bi awayekî berfireh ji maf xwe hate dûrxistin û ji qadên jiyanî hate paşguhkirin. Piştî şoreşê jinê cihê xwe di hemû qadan de girt, bi hatina HTŞ ser hukmê Şamê êdî dîsa xeteriyek ser rewşa jinan çêdibe, metirsiya vegerandina jinê mîna demên berê derdikeve holê, di riya hin daxuyaniyên ku ji hin aliyan tên derxistin di nava hikumeta nû de. Derbarê vê mijarê de hevseroka Meclisa Sûriya Demokratîk Leyla Qereman ji rojnameya me re axivî.

**‘Sûriya qonaxeke dîrokî jiyan dike’**

Hevseroka Meclisa Sûriya Demokratîk Leyla Qereman diyar kir ku piştî rûxandina rêjîma Eseed Sûriya qûnaxeke dîrokî jiyan dike û wiha got:“Em kêliyên giring ji dîroka Sûriya nû jiyan dikin, ev qonax ji bo tevahî katagoriyên Sûriyeyê pir giringe, ku Sûriyê ber bi demokratîkê û temsîlkirina dengê Sûriyeyan biçe, piştî salên dûdirêj ji zilm, zordarî û nijadperestiyê”.

Leyla Qereman di axaftinên xwe de bal kişand ser rewşa jinê di çarçoveya rêjîma Esed û wiha pê de çû:“Dema ku em van kêliyên dîrokî û qonaxa ku Sûriya tê de derbas bû bibîr bînin, divê di serî de bal bê kişandin ser rewşa jina Sûrî, em zanin ku jina Sûrî cihekî wê yê dîrokî di civaka Sûriyê de hebû, di riya beşadrbûna wê di tevahî qadên jiyanê, lê piştî desthilatdariya Baas hate ser hukmê Sûriyê ji milekî din ve jî rola jinê hate paşguh kirin, herwiha hate dûrxistin ji hemû qadên jiyanê bi taybet di qada siyasî de.

**‘Giringiya rola jinê di pêşeroja Sûriyê de’**

Di dema ku Sûriyeyî hêviya guhertinên demokratîk dikin, hin daxuyanî ji hêla HTŞ ve hate derxistin derbarê paşguhkirina rol û cihê jinê ku hêrseke mezin ji aliyê jinan ve derket, derbarê vê yekê de Leyla Qereman wiha anî ziman:“Mixabin ku em van daxuyaniyan guhdar dikin, di demeke ku hewildanên ber bi xêzkirina Sûriyeke nû çêdibin, ji taybetmendiyên demokratîk û wekheviyê, bi taybet derbarê rola jina Sûrî bi hemû gelê wê, ji ber ku jinê şanseke mezin ji êşê kişand. Jinê li ser tevahiya astan beşeke mezin ji têkoşînê kir, bi taybet bi destpêkirina şoreşê di sala 2011`an de, ji bo rêxistinkirina refên xwe ya herî li pêş bû, bawer bû ku ew hevkara bingehîne di avakirina Sûriya de”.

Leyla Qereman destnîşan kir ser rola jinê û beşdarbûna wê di avakirina Sûriya nû de:“Giringe ku beşdarbûneke çalak ya jinê hebe di qonaxa veguherîna siyasî de. Em di Meclisa Sûriya Demokratîk de tekez dikin ku hebûna jinê di her qonaxeke ji qonaxê veghuerîna siyasî de pir giringe ji bo serkeftinê, ji bilî vê yekê wê tu serkeftin tune be, mîna ku me di çarçoveya 13 salan dît ji temenê aloziya Sûriyê. Pêwîste ku madeyên destûrî hebin ku parastina mafên jinan bikin di Sûriyê de, ji destpêka dîrok û helwesta wê ya di dîrokê de û heta niha”.

**‘Yekbûna Refên jinan pêwîste’**

Leyla Qereman tekez kir ser yekbûna helwesta jinan di vê qonaxê de û wiha got:“Ev rastiyeke qonaxeke ku bi hezaran Sûriyeyî li benda wê ne, ku di salên aloziyê de pir êş kişandin, di nav de jin, ji ber vê yekê divê jinên Sûrî hesasiyeta vê qonaxê nas bikin, kar û xebat ji bo yekbûna helwesta xwe bikin. Bi yekbûna dengê jina kurd, ereb, durzî, xiristiyanî, suryanî û ermenî wê Sûriyeke nû, Sûriyeke demokrarîk were avakirin.” Leyla Qereman di dawiya axaftina xwe de bang li tevahî gelê Sûriyê kir, ku destwerdanên derve red bikin, da ku ji xeletiyên berê sûd bigrin û wiha got:“dirêjbûna aloziya Sûriya, sedema bingehîn destwerdanên derve bû weke Tirkiyê û hin hêzên heremî, ji dewletên ku berjewedniyê wan di dirêjkirina temenê aloziyê de hebû. Li ser hesabê xwîna gelê Sûriyê û ne bidestxistina diyaloga Sûrî-Sûrî, ji ber vê yekê Sûriya nû tê xêz kirin, Sûriya ji hemû Sûriyeyan re ye, em ne hewcdarê destwerdanên derve ne, ji bo ku ji xeletiyên ku di salên aloziyê de qewimîn dûr bikevin”.

## Ji Pênûsa Jin

### Sozdar Cîhad jineke kedkar bû

**Nehîr Pale**

Jina ku dikare têbikoşe, dibe ku kedkar û fedekar be. Ew ya herî zêde ye ku hebûna xwe diyar dike û pêdiviya civakê bi wan heye. Sozdar Cîhad (Şehnaz Omer) yek ji jinên ku bi dil û can xizmeta doza jinê dikir.

Şehnaz Omer sala 1974`an li gundê Qizil Baş ê navçeya Bulbulê girêdayî bajarê Efrînê ji dayîk bûye. Xwişka wê Sozdar û birayê wê Cîhad berî wê tevlî Tevgera Azadiya Kurd bibûn. Ew dema tevlî Tevgera Azadiyê bû navê xwişk û birayê xwe rakir.

Jina welatparêz Sozdar Cîhad sala 1999`an ji taxa Zorava ya Şamê biryar da ku rêça xwişk û birayê xwe bişopîne. Ji girêdana Sozdar a bi Tevgera Azadiyê re tê gotin aşk, dikarîbû her tiştê xwe ji bo doza xwe feda bike. Ji malbata xwe re digot eger ew tevlî nebe wê heyanî ku bimrê di gurava birçîbûnê de be. Ew cesareta wê hebû ku xwe bide ber kar û berpirsyartî rabike.

Ew yek ji jinên ku rûmeta wê li ber dilê wê gelekî ezîz bû, ji ber tucarî nedigot ez nizanim, ez nikarim, ez westiyame, yan jî destûr nedida ku gotin li ser karê wê were kirin. Diviyabû di karê wê de tucarî kêm û kurtî dernekebane.

Ji destpêka şoreşa Rojava ciyê xwe di xebatên civakî û xebatên jin de digirt. Girîngiyeke mezin dida exlaq û nirxên manewî yên civakê. Fêrnebibû ku li ser keda kesekî bijî, wê ked dikir û xizmeta gel dikir. Feraseta dibe şoreşger xizmeta gel bikin, di jiyan û têkiliya xwe ya bi civakê re, pêk anî bû. Nêzî 20 salan li hemû Kantonên Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê xebitî. Li sazî û meclisên jin xebitî û her tim xizmeta jin dikir. Ji bo wê ya girîng zerarê nede kesekî û hewl dida ku erkê xwe yê li beramberî tevgerê pêkbîne.

Dewleta Tirk a dagirker ji destpêka şoreşa Rojava ve êrîşî tevger û xebatên rêxistinî yê jin dike. Bi dehan jinên têkoşer ku berpirsyartî radikirin, ked didan û erka xwe pêktanîn ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve hedef dihatin girtin. Şehîd Sozdar Cîhad jî 10`Çile 2025`an di encama bombebarana balafirên dewleta Tirk şehîd bû.

Şehîd Sozdar Cîhad ji ber ku jineke kedkar û karker bû, divê hebûna wê wenda nebe. Karkerên jin li hemberî sîstema feodal û kaptalîzm dest bi têkoşînê kirin. Bi hezaran canê xwe feda kirin da ku jin bighîje mafên xwe û bi rûmet bijî. Di Tevgera Azadiyê de hevala Sozdar û hemû şehîdên jin ji bo rûmet, wekheviya di navbera jin û mêr û edaletê têkoşiyan. Niha jî jin li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê têdikoşe da ku civaka demokratîk, ekolojîk û azadî xwaziya jin ava bibe. Di vê têkoşînê de hebûna jinên kedkar û karker diyare, ji ber ew tenê dikarin ji bo welatparêzî, wekhevî û edaletê dev ji hemû daxwazên xwe berdin û xizmeta jinan bikin. Jin niha ciyê xwe di nava şerê rûmetê de digrin, nirxên ku li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dê bi ked û xwîna xwe biparêz in.



# Bavê Teyar bû dilsozê gelê xwe

Lîstikvanê kurd ê şanoyê Cuma Xelîl Îbrahîm bi navê din(Bavê Teyar) ê ku di êrîşa dewleta Tirk ya li ser Bendava Tişrînê de bi giranî birîndar bibû, jiyana xwe ji dest da. Bavê Teyar di hevpeyvîna xwe ya berya êrîşê de gotibû ”Em ji mirinê natirsin, em ê heta dawiyê axa xwe biparêzin.

**Amara Baran/Qamişlo**

Bavê teyar ku bi şano û pêkanokên xwe li çar parçê kurdistanê dibû çavkaniya kenê ser lêvên zarok û mezinan, di encama êrîşên dewleta tirk a dagirker de û piştî ku birîndar bû û birîna wî giran bû û rixmî hemû hewildanên bijîşkan jî şehîd ket.

**Kurte jiyana Bavê Teyar**

Bavê teyar yek ji navên girîng yên ku bi şanoya kurdî dihat naskirin û bi karekterê xwe dibû sedema coş û kenê ser lêvên zarokan. Bavê Teyar ku bi navê xwe yê rast Cuma Xelo Îbrahîm di sala 1957’an de li bajarê Qamişlo ji dayîkbuye û li wî bajarî zewiciye û bavê 8 zarokane. Bavê Teyar di sala 1989’an û vir ve di nava xebatên çand û hunerê de cihê xwe digirt û di hemû kar û xebata xwe ya şanogeriyê de pirsgirêkên civakê bi awayekê zelal vedigot.

**Koma Bavê Teyar di sala 2001’an de hat damezrandin**

Koma Bavê Teyar di sala 2001’ an de li bajarê Qamişlo hat damezrandin û Bavê Teyar di damezrandina wê komê de ne tenê şano, mûzîk, fîlm, rep û gelek bername lidardixistin. Di komê de bi giştî 10 endam hene ku 6 ji wan endamên fermîne. Herwiha 3 endamên jin jî hene bi navê Eyşo, Fato û Zelîxe dileyîzin. Bavê Teyar bi sedan bername û 6 jî kurte fîlim çêkirine. Tenê daxwaza wî ew bû ku biçe tirkiyê û xwepêşandanan li dar bixe.

**Bavê Teyar bi hunera xwe rastiyan bi civakê dide nas kirin**

Armanca Bavê Teyar ji vê xebatê ew bû ku pirsgirêkên di nava civakê de bi awayekê zelal bîne ser ziman û civakê bike ferqa rastiya wan de. Di nav komê de bi kurdiyeke dewlemend diaxivin ku gelê xwe teşwîqê zimanê kurdî bikin. Hemû bernameyên ku hatine kişandin li ser esasê pirsgirêkên civakî ne û di heman demê de çareseriyê jî nîşan didin. Rexneyê li paşverûtiya nav civakê dike bi taybet di nav civakê de ku jin pir biçûk û kêm tê dîtin û gelek caran tên zewicandin û vîna jinê piştgoh dikin. Koma Bavê Teyar hewil dide ku bi hunera xwe civakê hişyar bike û civakê têxe ferqa ku jin çiqas bi qîmete.

**1995’an de dibe mêhvanê Rêber Apo**

Daxwaz û xeyalê her welatparêzekê ew e ku rojek Rêber Apo bibînin û pêre wêneyekê an jî sohbetekê germ bide meşandine. Bavê Teyar di temenê xwe yê ciwaniyê de xeyalê xwe pêk tîne û di sala 1995’an de diçe cem Rêber Apo. Bavê Teyar welatparêziya xwe û girêdanbûyina xwe ya bi tevgera azadiyê re tu car kêm nekir. Keça Bavê Teyar Amara ku îro di girtîgehên



Tirkiyê de ye, Bavê Teyar wê diyariyê tevgera azadiyê dike û dibêje ku ez bi keça xwe ser bilindim. Bavê teyar li çar parçên kurdistanê bi pêkenokên xwe dihat naskirin, dema ku mirov li Bavê Teyar mêyze dike dibîne ku çiqas girîngî dide civakê, hertim bi şanoyên xwe dilê gel şad dikir.

**Bavê Teyar bi hunera xwe dibe cihê coş û kelecana tevahî civakê**

Bavê Teyar dema ku dibîne civak di nav êş û xizaniyê de jiyan dike, dixwaze bi pêkenokên xwe bibe cihê coş û kêfxweşiya gel. Bavê Teyar dibêje” Ji ber ku gelê kurd bi hezaran salin di nav êş û zilmê de dijîn. Divê gelê me dîrok, welat û nirxê xwe nasbike û biparêze. Êş û azarên bav û kalên xwe ji bîr neke ku bizanibe û wek civakên din bi coş û kelecan be. Ji bo wê jî em hewil didin bibin çavkaniya coşê ji gelê xwe re “

**Me kefenê mirinê çirand**

Bavê Teyar ji bo parastina axa xwe di 18’ê çileyê de bi hevalên xwe re berê xwe dide bendava tişrînê. Bavê Teyar ku berxwedanê wek felsefeya afrandina jiyanê dibîne. Bavê Teyar di hevpeyvîna xwe ya li ser bendava berxwedanê û şehîdan bang li dewleta tirk dike û dibêje “tu nikarî bi tang û topên xwe coşa me bişkînî em ji êrîşên we natirsin me kefenê mirinê çirandiye. Bendava tişrînê ji bo min qada berxwedanê ye.” Bavê Teyar di 18’ê meha Çileyê de di encama bombebarana dewleta tirk de bi giranî birîndar bû û di 19’ê çileye de jiyana xwe ji dest dide.

# Reşîdê Kurd Evîndarê ziman û wêjeya Kurdî

**Navenda Nûçeyan**


**Helbestvan Reşîdê Kurd yek ji helbestvanê navdar yê ku ji ber Kurd bû, bi ziman, çand û nirxên xwe ve girêdayî bû, lê di encama siyaseta pişaftinê de ji ware xwe koçber bû, jiyana wî tijî êş, azar û bi hesreta welat derbas bû.**

Gelek pêşeng û zanyarên kurd hene di dîrokê de, di xalên berxwedanî û têkoşîna li dijî zor û zexta li hember dagirkerên Kurdistanê dişbin hev. Di jiyana xwe de pir êş û zehmetî kişandin, ji welat hatin mişextkirin û bi hesreta bêrîkirina welat jiyana xwe qedandin. Yek ji wan helbestvanê navdar Reşîdê Kurd e ku jiyana wî di nav zext û işkenceyên di nava girtîgehan û mişextkirinê de derbas bû.

Reşîdê Kurd di Sala 1910`an li gundê Rewşatê yê bi ser Dêrika Çîyayê Mazî yê girêdayi bajarê Mêrdînê ve ji dayik dibe. Xwendina xwe li gundê Dêrikê, Mêrdînê û salekê li Dibistana Konyayê kiriye. Li gorî hinek çavkaniyan navê dayika Reşîdê Kurd Zînê ye. Dû hevjînê wî hebûn navê wan Seb`a Sorkî keça xalê wî ye zarokên wan“ Melfeya, Xeza û Zîn”, ya din navê wê Xatûn Mûsa bû ji gundê “Erban” ya bajarê Amûdê, zarokên wan“ Perwîn, Berwîz, Mhoş û Comer”.3 birayên wî hebû û du xwişk navê wan evîn: Bekir, Xalid, Ehmed, Sultana û Ayşe

Sedema ku paşnavê xwe dikin Kurdo yan Kurd; ji ber ku Kurd bû û hêj zagona dewleta Tirk ya dagirker ku navê Kurdan li gorî zimanê xwe ferz dikir nexistîbû meriyetê. Bi awayekî xwezayî bi rêya herî asayi, ji ber ku ji ziman, çand û welatê xwe hez dikir û dida hezkirin, bi wî navî dihat danasîn. Sala 1930’yî berî qedandina xwendina xwe ya dersdariyê bi çend mehan hate girtin. Carekê ji girtîgehê direve lê dîsa tê girtin. Piştî gelek îşkence û zextê careke din ji girtîgehê direve û derbasî Rojavayê Kurdistanê dibe. Li navçeya Amûdê bi cih dibe û lêkolînên xwe li ser zimanê dayikê û giramêr kûrtir dike. Li wir pirtûka xwe ya yekem ya bi navê “Zimanê Kurdî û Gramêra Wê” dinivîse û sala 1956’an li Beyrûtê dide çapkirin.

Reşîdê Kurd li gel Seydayê Cegerxwîn, Kamîran Bedirxan, Heciyê Cindî, Erebê Şemo, Qedrîcan, Osman Sebrî ji bo parastina zimanê dayikê û çanda Kurdî bi hevre kar meşandine. Ji ber tevgera wî kurdayetiyê dewleta Sûrîyeyê




ew gelek caran girt û îşkence lê hate kirin. Li Sûriyeyê jî gelek zehmetî dikişand. Qeyranên siyasî derdiketin û di encama wê de ew jî neçar ma biçe Iraqê. Li Iraqê jî dema sala 1958’an ji bo penaberiyê serlêdan kir, serlêdana wî nehat qebûlkirin û ew vegrandin Sûriyeyê. Wê demê bi salan di girtîgehan de ma.

Yekemîn çîrok, gotar û helbestên xwe bi zmanê kurdî li Şam û Beyrûtê, di kovara Hawar û Roja Nû belav kir. Reşîdê Kurd di Desteya Edîtoriya rojnameya “Dengê Cotkar” ku bi navê kongreya cotkarên Cizîrê sala 1951`ê hate derxistin cihê xwe digirt. Sala 1949’an helbestvan Reşîdê Kurd li Sûriyeyê bi nexweşiya weremê ket û bi nexweşiyek giran ya kezebê re bi salan têkoşîna jiyanê dida. Sala 1967’an berê xwe da Yekîtiya Sovyetan û ji bo tedawiyê diçe Bulxarîstanê. Di 20’ê Kanûna 1968’an diçe ser dilovaniya xwedê û li bajarê Amûdê hate veşartin û bi şehîdê girtîgeh û zindanan hate bi nav kirin. Tê gotin dema dizane wê bimire van gotinên gelekî bi wate dibêje; “Hîn pir kar û barên min hene ku divê ez bikim, min ew karên xwe nebirine serî, na divê ez niha nemirim. Divê ez vegerim baxçeyên Dêrikê ku min ji mêj ve bêriya wir kiriye, paşê bila mirin were.”

**Hîn berhemên Reşîdê Kurd;**

Gelek nivîs li ser çand, wêje, ziman û tiştên din nivîsiye. Ji lew re wek evîndarê ziman, çand û wêjeya Kurdî dihate naskirin. Pirtûka bi navê “Rêzimanê Kurdî” ku li ser zimanê dayikê û gramera wê lêkolîn kiriye; pîrtûkên “Ez Reşîdê Kurdî” û “Kerwan”, “Zindan” li girtîgeha Sûriyê ya Meza nivîsandiye.

## Têbînî



### Gelo Jîriya Çêkirî dê helbestan jî binivîse?

**Kemal Necim**

Ji ber ku li herêmê di mijara parastina mafên dahênana wêjeyî de tu dezgehek taybet tune ye, carna hin dahêner û nivîskar gazinan dikin ku danîn û nivîsên wan têne dizîn bêyî ku karibin mafên xwe bixwazin. Wilo xuyaye ku ji niha heta ku dezgeheke wiha çê bibe dê ev rûdan berdewam bike. Lê mijareke din ya trisnak ku niha bala daneran dikşîne bi taybet ya helbestvanan, mijara (jîriya çêkirî) AI, ye ku li gorî hin lêkolînan êdî Jîriya Çêkirî dikare helbestan binivîse ku mirov nikare cudahiya di navbera wan helbestan û helbestên ku mirov dinivîsin de zanibe.

Ev lêkolîn ji hêla du fîlozofên zanistê Brian Porter û Edward Machery ve hatiye çêkirin. Di encama lêkolînê de diyar dibe ku nimûneyên helbesta ku ji hêla AI`ê ve hatin çêkirin ji hêla pir kesan ve hetine pejirandin.

Di lêkolînê de 696 kes beşdar bûn, û şêwazên deh helbestvanên navdar ji helbestvanên klasîk ên wekî Geoffrey Chaucer û William Shakespeare, heya helbestvanên hevdem ên wekî Dorothea Laski hatin zarvekirin. Encaman destnîşan kir ku beşdaran di pir rewşan de helbestên çêkirî ji yên mirovan baştir dîtine.

Di rewşeke wiha de gelo ew kesên ku êdî ditirsin AI`ê li şûna mirovan helbestan binivîse mafdar in, lê ew ji tiştekî ku tune ye dirtisin.

Bê guman pir sedem hene ku daner û nivîskar û bi taybet helbestvan li ser bitirsin, lê kî divê bêhtir li ser xwe û helbestên xwe bitirse û kî divê netirse?

Tê zanîn ku helbesta mirovî, ango ya ku mirov dinivîsin helbesteke wihaye ku dikare hevgihîneke hestyarî û civakî biafirîne, lê ev hestyarî di deq û danînên çêkirî de tune ne. Her wiha helbest ne tenê teknîkek an şêwazek e, lê belê kiryar û reftareke civakî ye armanca wê ew e ku têgihîştina me ya der bar hev de zêde bike.

Her çiqas Jîriya Çêkirî di hin waran de serwer e, lê hîna jî karîna wê ya hilberandina nivîsan bi kûrahiya hestyarî û afirîneriya rastîn, cihê guman û pirsê ye.

Helbest bi giranî xwe dispêre peywendiya di navbera xwendevan û nivîsê de, ku li vir rola sereke ya xwendevan e ku karibe peyvan bi giyan bike û şîrove bike.

Jîriya Çêkirî kariye heta asteke mezin xwe nêzî nivîsîna helbestan bike, lê armanca bingehîn a helbestvanan her afirînerî ye, ne çêkirin e. Jîriya Çêkirî dikare bi algorîtmayên xwe helbestan çêbike, lê navika helbestê her mirovahî ye. Helbest ne algorîtma ye, ew wate, hest, raman û hişmendî ye.

Bi van çend peyvên dawiyê (wate, hest, raman û hişmendî), mirov dikare bighêje bersiva pirsa xwe, ka kî li ser xwe û helbestên xwe ditirse.

Ew kesên ku li gorî wan danîna helbestê reftar û kiryareke hêsan yan rêzkirina peyvan e, ew ên ku der barê dîroka helbestê, hêman û binyadê helbestê û şêwe û teşeyên helbestê tiştekî nizanin, tenê radibin bê rêgez û pîvan, bê hest û wate û raman, peyvan û hevokan li pey hev rêz dikin û ji me re pêşkêş dikin û dibêjin me helbest nivîsiye, ew kes dê li ser xwe û helbestên xwe bitirsin, ji ber ku êdî Jîriya Çêkirî jî dikare li şûna wan di kêmî xuleyekê de helbestên bê hest, raman û wate çêbike.

# Zêdetirî 30 hezar malbatên Efrîn û Şehbayê li herêma Rêveberiya Xweser bi cih bûne

Hevserokê Ofîsa Karûbarên Penaber û Koçberan Şêxmûs Ehmed da zanîn ku zêdetirî 30 hezar malbatên Efrîn û Şehbayê û 7 hezar kes ji deverên din yên Sûriyê berê xwe dan herêma Rêveberiya Xweser û got, "Neteweyên Yekbûyî li hember rewşa koçberan bi erkên xwe ranebûn."

**Zana Roj/ Qamişlo**

Piştî zêdetirî 60 salî ji serweriya Mala Esed li ser Sûriyê, di 8`ê Berfenbara 2024'an de desthilatdariya Bass bi temamî hate rûxandin û Heyet Tahrîr El Şam bi rêbertiya Ebû Mihemed Colanî li ser tavahî Sûriyê serwer bû. Heyet Tehrîr El Şam careke din berê xwe dan herêmên Kurdan, bi taybet Herêma Şehbayê ya ku gelê Efrînî piştî dagirkirina herêma Efrînî di 18`ê Adara 2018 an dagirkiribû, bi darê zorê koçberî herêma Şehbayê bûn. Gelê Efrînî ji 7 salan ve di herêma Şehba û Til Rifet de jiyan dikin, û bi gaveke nû li ser esasê vegera Efrînê dest bi jiyanê kirin.

Lê di 1`ê Berfenbara 2024`an de komên çeteyên girêdayî dagirkeriya Tirkiyê de berê xwe dan Şehbayê û ev gel ji ber qetlîameke giştî necar man ku terka malên xwe bikin û derbasî herêmên Firat û Cizîrê yên Bakur û Rojhilatî Sûriyê bûn. Têkildarî giştî rewşa koçberên ku ji tevahê xaka Sûriyê berê xwe dane herêmên Hevserokê Ofîsa Karûbarên Koçber û Penaberan ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Şêxmûs Ehmed ji rojnameya me re axivî.

**Li hember rewşa Sûriyê ragihandina seferberiyê**

Şêxmûs di destpêkê de bal kişand ser rewşa ku Sûriyê di demên dawiyê de tê re derbasbûye û wiha got: "HTŞ ê serweriya xwe li ser hemû Bajarên Sûriyê kir û di cend rojan de Rêjîma Bass hilweşiya. Komên çeteyên dagirkeriya Tirkiyê berê xwe dan herêmên gelê Kurd weke Herêma Şehbayê ya ku ji aliyê Hêzên YPG û YPJ`ê ve di sala 2016`an hatibû rizgarkirin. Di Şehbayê de bi deh hezaran koçberên Efrînê yên ku neçar mane ji Efrînê derkevin ji 7 salan ve tê de jiyan dikin. Komên çeteyên ku gelê Kurd her tim weke dijmin dibînin xwestin di wir de jî kiryarên xwe pêk bînin, lê bi lihevkirineke di navbera HSD, HTŞ û Kooalisyona Navnetewî gelê Kurd yên Efrîn û gelek hemwelatiyên herêma Şehbayê yên resen derbasî herêmên Rêveberiya Xweser bûn. Ji xwe Rêveberiya Xweser bi hemû hêza xwe kete nava seferberiyê di demeke ku herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê rastê êrîşên dagirkeriya Tirkiyê dihat."

**Hejmara kesên ku di herêma Rêveberiya Xweser de bi cih bûne**

Şêxmûs girêdayê hejmara kesên ku berê xwe dane herêmên Rêveberiya Xweser wiha got: "Di encama serweriya HTŞ ê li ser herêmên Şehba û Til Rifetê de bi giştî, hejmara gelê Efrîn û welatiyên Şehbayê ku derbasî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûne, zêdetirî 30 hezar malbat yani nêzî 121 hezar kes. Her wiha 7 hezar kes ji herêmên Başûr û Rojhilatî bajarê Helebê berê xwe dan herêmên Rêveberiya Xweser û niha ew li navenda pêşwaziyê yê li Reqa yê dimînin".

**Gel li hemû kantonan bicih bû**

Şêxmûs di berdewamiya axaftina xwe de ev anî ziman: "Bi destpêkirina vê pêvajoyê re û pêlên koçberiyê hemû sazî û destgehên Rêveberiya Xweser ketin rewşa seferberiyê û li ser wê esasê tevgeriyan. Di rewşekê wiha awerte de bi lez tevgerandin pêwîst dikir, piraniya gelê ku derbas herêmê bûne di destpêkê de li navendên Tebqa û Reqayê hatin pêşwazîkirin, li gorî derfetan di dibistanan de hatin bicihkirin. Her wiha li hemû bajarên herêmê belav bûn weke Hesekê, Qamişlo, Dêrîk, Tirbespiyê, Amûdê û hwd ew jî li dibistanan de hatin bicihkirin".

**`Asta alîkariya Navnetewî divê ji vê zêdetir be`**

Şêxmûs destnîşan kir ku ev rewş hêza Rêveberiya Xweser derbas kir û diviyabû alîkariya navnetewî zêdetir ba û wiha domand: "Di dema derbasbûna van koçberan de gelek saziyên navnetewî yên girêdayê neteweyên yekbûyê YN her wiha saziyên xwecihî û yên nefermî jî hinek alîkarî pêşkêş kirin û heyanî astekê niha jî berdewam in, lê li gorî hejmara zêde ya gelê Ku berê xwe daye van herêman ev yek zêdetirî hêza Rêveberiya Xweser bû. Li gorî vê yekê divê asta alîkariyê ji welat û rêxistinên navnetewî ji vê zêdetir be, da ku pêwîstiyên vî gelî werin bicihkirin. Di vê pêvajoyê de me gelek bangawazî kirin ku hin korîdor û derî bêne vekirin weke deriyê Til Koçer bê vekirin û alîkariya nevnetewî bê kirin. bê guman alêkarî ne tenê di aliyê pêwêstiyên jiyanî be divê di mile bicihkirina van gelî de jî bê kirin û bi tayebt di aliyê tenduristê de".

**Bicihkirina gel di dibistanan de bû asteng li pêşiya werzê xwendinê**

Şêxmûs da zanîn ku gelek zehmetî derketin û wiha rave kir: "Astengiyên sereke di aliyê tebduristiyê de derkete holê, nexweşxaneyên li herêmên weke Tebqa û Reqa têrê nedikir ku ji gelê ku berê xwe dide wan nexweşxaneyan tedawî bibin. Her wiha zehmetiya mezintir jî ji ber bicihbûna



gel di dibistanan de, hemû dibistanên li Tebqa, Reqa û qismek ji Hesekê hatin rawestandin. Ev yek jî bû sedem ku şagirt ji xwendinê dereng bikevin".

**`Dewletên Yekbûyî bi erkên xwe ranabin`**

Şêxmûs di dawiyê de banga civaka navdewletî kir ku pêşî li dagirkeriyê bigrin da ku zêdetir gel êşa koçberiyê jiyan neke û wiha got: "Em careke din banga hêz û aliyên têkildar yên navnetewê dikin ku pêşî li koçberiyê bigrin, her wiha bi erkên xwe rabin ku alîkariyê pêşkêş van herêman bikin. her wiha bi helwestekî navnetewî li hember êrîşên dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên girêdayî wê derkevin ku ev yek bê rawestanidin. Ji ber bandora xwe li ser herêmê bi giştî dik û derfetên di destê Rêveberiya Xweser de gelekî kêm in. bi taybet dewletên yekbûyî bi erkên xwe ranebûn da ku deriyên alîkariyê ji gelê Efrîn û Şehbayê re vebibin".

# 'Divê rewşa girtiyên li Efrînê bê çareserkirin'

**Navenda Nûçeyan**

**Ibrahîm Şêxo diyar kir ku bêdengiya civaka navdewletî dibe sedema zêdebûna binpêkirin û kiryarên dijmirovî ku ji aliyên çeteyên dewleta Tirk ve li herêmên dagirkirî tên kirin .**

Di sala 2018`an de, artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê kantona Efrînê dagir kirin, di encama vê êrîşê de zêdetirî 300 hezar şêniyên Efrînê bi darê zorê hatin koçberkirin û li malên wan malbatên çeteyên dagirkeriya Tirk bicih kirin. Çeteyên dewleta Tirk dest bi guhertina demografiya herêmê kir, hovtrîn binpêkirin li dijî şêniyên resen kir, di nav de destserkirina mal û milkên şêniyan, dizî, talankirin û xirabkirina deverên kevneşopiyên çandî, herwiha hejmareke mal û dibistan li tevahî navçeyan, bi taybet navenda bajarê Efrînê kirin zindann, tê de binpêkirinên dijî mirovahiyê derheqê sivîlan de pêk anîn.

Piştî rûxandina rêjîma Baas, piraniya girtiyên di zindanan de mîna Seydnaya hatin rizgarkirin, lê hîn jî li girtîgehên Efrîna dagirkirî binpêkirin dijî miorvahiyê derheqê girtiyan pêk tê,



derbarê vê mijarê berdevkê Rêxistina Mafên Mirovan a Efrînê Ibrahîm Şêxo ji rojnameya me re axivî.

**'Bi destekdayîna dewleta Tirk binpêkirin tên kirin'**

Ibrahîm Şêxo di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Ev 6 salin dagrkeriya Tirk li Efrînê berdewam e, li kêleka wê jî sûc û binpêkirinên derheqê şêniyên resen zedetir dibe, ev bibpêkirin dikevin asta sûcên şer, lê sûcdar nayên muhasebekirin. Bi piştgirî û destekdayîna dewleta tirk komên çeteyan kiryarên hovane bi taybet derheqê gelê kurd pêk tîne, têkiliyên tirkiyê bi van komên tundraw berdewam dike. Ji bilî binpêkirin û kiryarên derheqê şêniyan, siyaseta guhertina demigrafîk ya sîstematîk bi kar tînin, da ku kurdan li vê herêmê qir bikin."

**'Cihên fermî dibin girtîgeh'**

Ibrahîm Şêxo destnîşan kir ku li tevahî navçeyên Efrînê derdora 21 girtîgeh hatine avakirin, her komeke çekdar li cihê ku lê bi cih bûne girtîgeh avakirine û wiha berdewam kir: "Herwiha girtîgehên navendî jî hene weke ya Marata ku du beşên wê hene ya sivîl û leşkerî. Cihên fermî weke dibistanan xistine cihê lêpirsîn û girtîgeh. Dibistana Tîcara li Efrînê bûye navenda Polîsên Leşkerî. Geleke şêniyên Efrînî ji 6 salan ve li van girtîgehan hatine girtin û çarenûsa wan ne diyare."

**'Awayên îşkenceyê cuda ne'**

Ibrahîm Şêxo wiha pê de çû: "Di hemû girtîgehan de eynî binpêkirin tê kirin, awayên îşkenceyê cuda ne, îşkenceya pîskolojîk û fîzîkî tê kirin, bi taybet derheqê jinan ferq û cudahî di girtîgehan de nayê kirin. Çi jin be an mêr, lêdan û lêpirsîn eynî çeteyan li jin û mêran dikin. Gelek awayên îşkenceyê tê bikar anîn lêdana xertûmên kesk ya elktrîkê, birçîbûyîn heye, destdirêjî li ser jinan tê kirin, heqaret di dema lêpirsînê de tê kirin, bi taybet li girtîgeha (Hewar Kilis û Ra`î), ji xwe hatiye tekez kirin ku yên lêpirsînê û îşkenceyê dikin Îstxbarata Tiriyê ye, piraniya kesên hatin girtin dema berdana wan ev yek tekez dikin."

Ibrahîm Şêxo da zanîn ku girtîgehên berê yên rêjîma Bass hatin vekirin û girtî srrbest hatin berdan, herwiha navê kesên jiyana xwe ji dest dane hat eşkerekirin. Lê rewşa girtîgehên li Efrînê hîn wekî berê ye, binpêkirin û kiryar berdewamin, hîn jî welatî bi tawanbarkirin ku berê bi Rêveberiya Xweser re kar dikirin tên girtin.

**'Li hemberî berdana girtiyan pere tên xwestin'**

Ibrahîm Şêxo wiha domand:" Piştî dagirkirina Şehbayê, 300 kes vegeriyan Efrînê bi giştî hatin girtin û li hemberî berdana wan pere hate xwestin, di dema dawî de jî 6 xortên ciwan ji gundewarê Şêrawayê ji hêla koma Hemzat û Emşat hatin girtin, ew tesîlmî polîsên leşkerî kirin, li hemberî berdanê ji malbatên wan re 2 hezar dolar xwestin, ji ber ku malbatan nikarîbûn fidiyê bidin, ew şandin girtîgeha Ra`î."

**'Li hemberî binpêkirinan bêdengî heye'**

Ibrahîm Şêxo wiha anî ziman: "Gelek bangewazî ji bo hikumeta demkî heye da ku zextê li polîsên leşkerî bê kirin û girtî bên berdan. Em lêpirsîn û binpêkirinan radestî saziyên navdewletî û komîteya lêpirsînê dikin, gelek sazî jî binpêkirinên ku çêdibin belge dikin û rewşê dişopînin, lê tişteke rastî li ser erdê nayê kirin, ev jî sûceke ku li hember binpêkirinan bêdeng dimînin. Divê rewşa girtiyên li Efrînê bê çareserkirin."

Ibrahîm Şêxo wiha axaftinên xwe bi dawî kir: "Gelek şêniyên Efrînê derbasî zindanên Tirkiyê weke Xazî Entab û Kilisê kirin, li gorî qanûnên navdewletî nabe ku dewletek dagirker girtiyên bajarên dairkirine li gorî destûraên xwe wan ceza bike, lê mixabin ev yek îro tê kirin û hîn çarenûsa tu kesî ne diyar e, ne li zindanên hundir an yên tirkiyê, bêdengiya civaka navdewletî îro dibe sedema zêdebûna van binpêkirinan.



# 'Gel bi Rêveberiya Xweser re berxwedaniyeke dîrokî didin meşandin'

Hevserokê berê yê Meclisa Cîbicîkar a kantona Cizîrê, Teleet Yûnis salvegera damezirandina Rêveberiya Xweser bibîr xist û da zanîn ku ji destpêka avabûn rêveberiyê ve êriş ji hêla hemû hêzên desthilatdar ve hatine kirin û wiha got: "Îro gel bi hemû pêkhateyên xwe ve li gel Rêveberiya Xweser berxwedaniyeke dîrokî dikin."



**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Di 21'ê Çileya 2014'an de Rêveberiya Xweser a kantona Cizîrê weke yekemîn car li ser asta Rojava û Sûriyê hate damezrandin. Piştî wê jî li kantonên din rêveberî bi heman sîstemê hatin avakirin, hetanî ku gihaşt asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Derbarê heman mirjarê Teleet Yûnis bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Rêveberiya Xweser di şert û mercên çawa de hate avakirin û çi guhertin bi xwe re anîn?**

Di serî de em salvegera damezrandina Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li şehîdên şoreşê, malbatên şehîdan û tevahiya gelên xwe pîroz dikin. Di 21'ê Çileya sala 2014'an de piştî tekoşîneke mezin a bi salan Rêveberiya Xweser li kantona Cizîrê hate avakirin. Rêveberiya Xweser yekem car li Cizîrê hat damezrandin, paşê li Efrîn, Kobanê û hwd… Di destpêka damezirandina vê rêberiyê de gelek êriş li serê hatin kirin û bû hedefa dewletên hegemon û desthilatdar. Rêjîma Baas hewl da ku Rêveberiya Xweser têk bibe û dewleta Tirk dest bi êrişî Rojava kir û bi riya DAIŞ'ê xwest Kobanê dagir bike. Piştî lewazbûna rêjîma Baas ku di wê demê de hemû saziyên wê ji xizmetê derketin û şoreş dest pê kir, êdî hewce dikir ku civak di hemû waran de xwe bi rê ve bibe. Rêveberiya Xweser di encama berxwedaniya gelan a li dijî zilmdariya rêjîmê ava bû. Wekî em dizanin ku rêjîma Baas siyaseta desthilatdarî, istixbaratî û navendbûyînê dida meşandin. Lê civakê li hemberî vê sîstemê li ber xwe da û dest bi rêvebirina xwe kir. Lewma jî gel bi hemû pêkhateyên xwe ve, partiyên siyasî, sazî û tevgerên jin û ciwanan li ser bingehê Neteweya Demokratîk derbasî qonaxeke nû bûn. Êdî serdema serweriya rêjîmê çû û bi fikrekî nû li ser bingeha sîstema demokratîk li hemberî sîstema netewdewletê civakê xwe bi rê ve bir.

**Bi dirêjahiya avabûna Rêveberiya Xweseriya Demokratîk heta roja îro jî bûye hedefa dewleta Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê, gelo sedem çiye?**

Rêveberiya Xweser bi dirêjahiya avabûna xwe ve rastî êrişan hatiye, di encamê de hin herêmên wê ketin bin sîwana dagirkeriya Tirk. Dagirkeriyê bi riya çeteyên DAIŞ û komên girêdayî xwe deverên mîna Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî dagir kir. Hêzên desthilatdar di hemû waran de êrişî Rêveberiya Xweser dikirin. Di destpêkê de êrişên siyasî hebûn, van hêzên desthilatdar dixwestin rêveberiyê û sîstema wê reş bikin. Herwiha van hêzan bi armanca têkbirina Rêveberiya Xwese, hertim didan xuyakirin ku Rêveberiya Xweser parçebûna xaka Sûriyê dixwaze. Di heman demê de hewldan hatin kirin ku danpêdaneke bi vê rêveberiyê li ser asta cîhanê pêk neyê. Herwiha ji milê aborî ve herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bifetisînin. Da ku Rêveberiya Xweser vala bihêlin û jêderên jiyana gelên me têk bibin, me dît ku çawa binesaziya Bakur û Rojihlatê Sûriyê hat hedefgirtin. Herwisa bi rê û rêbazên cuda xwestin dorpêça li ser gelên me bidin meşandin, ji van rêbazan jî qutkirina avê li ser gelên me. Sedema van êrişan jî ew e ku Rêvberiya Xweser xwedî projeyek demokratîk e û ev proje li dijî hêzên desthilatdar û hegemonîk e. Heta roja îro jî ev êriş bi tevahiya cureyên xwe ve li ser Rêveberiya Xweser û gelên wê tên meşandin. Lê gelên me bi hemû pêkhateyên xwe ve li nik rêveberiya xwe berxwedaniyeke dîrokî li dijî êriş û pilanan dide meşandin.

**Rêveberiya Xweser heya çi radeyê ji bo pêşeroja Sûriyê dibe nimûne û riya çareseriyê?**

Gelên Rojava û Sûriyê piştî têkçûyîna çeteyên DAIŞ'ê, rizgarkirina kantonên Reqa, Dêrazorê û hwd… bi hev re Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ava kirin. Ev projeya ji bo pêşeroja Sûriyê bû mînak, Sûriyeke ku hemû alî hev bipejirînin û bi hev re wekhev bijîn. Herwiha mafê tevahiya gelên Sûriyê di destûreke demokratîk de parastî be. Piştî hilweşandina rêjîma Baas êdî projeya Neteweya Demokratîk riya çareserkirina kirîza Sûriyê ye. Ev bûye 11 sal ji damezirandina Rêveberiya Xweser, ev proje ji hêla gelên Sûriyê li hemû parêzgehan berbiçav tê girtin û êdî bala wan tê kişandin. Hêjayî gotinê ye ku ev rêveberî sal bi sal mezintir û bi hêztir bû, hemû gel jî di nava vê rêveberiyê de cihê xwe girtiye. Her pêkhateyek bi ziman, çand û baweriya xwe dijî û xwe bi rê ve dibe û armanc ewe ku ev piroje ji bona tevahiya Sûriyê bibe riya çareseriyê. Êdî li ser bingeha demokrasiyê hemû pêkhate, kurd, ereb, suryan, çerkes û hwd… xwe bi rê ve bibin û bi hev re bi aramî bijîn.

# 'Em ê bi rihê Nazim û Cîhan bibin dengê QSD û YPJ'ê'

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

**Rojnamevan Ciwana Cuma ya ku êrişên dagirkeriyê û berxwedana gel a Bendava Tişrînê ji nêz ve dişopîne anî ziman ku dê berxwedaniya gel a bêhempa dagirkeriyê têk bibe û wiha got " Ger Bendava Tişrînê bê armanckirin dê karîsetekî mezin a mirovî rû bide."**

Êrîşên dewleta Tirk a li ser Tişrîn û Qereqozaqê ku di 8'ê Berfanbara 2024'an de destpêkir, ev 35 roj in bêyî navber berdewam dike. Ji ber êrîşan Bendava Tişrînê li ber hilweşînê ye. Tevî daxuyaniyên Hêzên Sûriyeya Demokratîk û Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriye û bi dehan saziyan jî ne êrîşên dewleta Tirk rawestiyan ne û ne jî ji raya giştî ya navneteweyî helwestekî cidî pêş ketiye.

Di derbarê êrişên dagirkeriyê û berxwedana çalakvanên mertalên zindî de, rojnamevan Ciwana Cuma ji rojnameya me re axivî.

**'Berxwedaniya şervanan li bendava Tişrîn û Minbicê bi piştgiriya gel bilindtirdibe'**

Ciwana Cuma ya ku ji roja destpêkê ve, êrişên dagirkeriya Tirk û li hemberî vê berxwedaniya gel ji nêz ve dişopînê dibêjê ku berxwedaniya Bendava Tişrînê berxwedaniya mirovahiyê ye û wisa dest bi axaftina xwe kir: "Dewleta dagirker ya Tirk û komên çete yên girêdayi wê wek her demê li ser axa Bakur û Rojhilatê Sûriyê




êrîşên xwe bênavber didomîn e. Vê carê jî Bendava Tişrînê xistiye armanc. Ji ber ku Bendava Tişrînê ji du aliyan ve stratejîk e. Aliyekê nêzî pira Qereqozaq a li sînorê bajarê berxwedanê Kobanê ye û di heman demê de jî aliyê xizmetguzariya herêmê kehrebê dide giştî Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Ji xwe wezîrê karê derve yê dewleta Tirk ya dagirker Hakan Fîdan jî, gelek caran anî ser ziman ku binesaziyên herêmê qaşo wek cihê leşkerî tên bikaranîn dê bên armanca êrîşên wan. Lê ev yek ne raste Bendava Tişrîn tenê ji bona xizmetgûzariya kehrebê ye û di heman demê de karkerên tê de kar dikin jî sivîlin. Ji ber wê yekê dewleta Tirk û komên çete piştî êrişên dagirkeriyê weke bajarên Heleb, Şehba û Til Rifet vê carê jî berê xwe dan Minbic û Bendava Tişrînê. Ev yek ji mehekê zêdetir jî, li wê derê berxwedaniyek bêhempa didome. Şervanên parastina Bakur û Rojhilatê Sûriyê QSD'ê, YPJ têkoşinekî di asta jor de didin meşandin. Li hemberî êrişên dagirkeriyê bi şêwazekê pispor li berxwe didin. Li dijî teknîka asta herî jor ya di destê dewleta Tirk ya dagirker de şer dike. Balafirên bêmirov hertim li ser esimanê herêmê de difirin. Gunde warên başûrê Kobanê ji aliyê balafirên şer yên girêdayi dagirkeriya Tirk ve tên bombebaran kirin. Gundê Sirînê û Qereqozaqê pir caran tên bombebaran kirin. Lê berxwedaniya şervanan dijî dagirkeriyê jî wan êrişan vala derdixîn e."

**'Bendava Tişrînê dê bibe Bendava serkeftinê'**

Ciwana got ku li hemberî êrişan gelê herêmê têkoşînek bêhempa dide meşandin û axaftina xwe wisa domand: "Gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê di roja destpêkirina êrîşan heya niha di bin hîma şerê gelê şoreşgerî û xweparastina cewherî dan xuya kirin ku gel li cem hêz û şervanên xwe cih digirin. Ji ber nerazîbûna êrîşên li ser xaka herêmê gel xwe li hemû bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê birexistin kir û çalakiyeke mertalên zindî pêkanîn. Her bajarekî Rojavayê Kurdistanê ji 7 û heya 70'ê saliyê bi coşekê tevlî vê çalakiyê bûn û berê xwe dan Bendava Tişrînê. Rûxmê hemû êriş û bomberdimanên dewleta Tirk ya dagirker berxwedaniya gel ya bêhempa didom e. Karwanên çalakvanan pir caran hate armanckirin. Lê gel ti caran gav paş de ne avêt û ji bona têkoşînê soz dan. Dema roja destpêka çalakiya mertalên zindî destpêkirî, komên karwanan yên destpêkê bi balafirên şer hatin armancgirtin û 5 welatî şehîd bûn û 15 kes jî birîndar bûn. Lê ev dîsa astengî ji bona çalakvanên mertalên zindî dernexist û berovajî vê çalakiya xwe hîn xurtir didin meşandin. Dema ku êriş pêkhat welatî ji erebeyên xwe daketin û heyanî bendavê bi meşê berdewam kirin. Bi her awayî dewleta Tirk ya dagirker bi armancgirtina hevalên me yên rojnamevan û di serî de rêhevalên me Cîhan Bilgîn û Nazim Daştan kirin armanc, ji ber ku wan dengê rastiyê, şer û pevçûnên li bendavê û binkeftina dagirkeriya tirk û kiryarên wê yên dijmirovî ji jîhanê re radigihandin. Çalakiya mertalên zindî dorvegere, dema ku karwanên welatiyên Kantona Cizîrê tê de cihdigirtin gihişte cihê çalakiyê dîsa êrişên dagirkeriyê destpêkirin, lê gel bi biryare ku têkoşîna xwe berdewam bike. Dewleta Tirk ya dagirker bi riya endam û dezgehên xwe yên ragihandina şerê taybet ve, hewil dide berxwedaniya ku tê meşandin berovajî nîşanî raya giştî bid e. Dayik, ciwan û zarok bi hemû tevlî çalakiyê bûne û bi dirûşmeya 'Em ji mirinê mezintirin' biryara xwe ya parastina axa xwe dan. Ev gel xwe bi ramanê Rêber Apo perwerde kir û stratejiya şerê gelê şoreşgerî ji bona xwe bingeh girt. Bi wî rihê gelê şoreşgerî dê dagirkeriyê têk biçe. Gel sekna bêhempa ya dijî dagirkeriyê raber kiriye ku êrîş neyê sekinandin dê dewleta Tirk ya dagirker li hemberî berxwedana gelan têk biçe."

**'Ragihandina şerê taybet hewildide berxwedaniya gel berovajî bide nîşan dan'**

Ciwana da raber kirin ku dewleta Tirk ya dagirker rastiyên ku tên jiyan kirin hewil dide bi rêya çapemeniya şerê taybet vala derbixîne û wiha got: "Ev berxwedanî di rûpelên dîrokê de navê xwe nivîsand. Bendava Tişrînê dê bibe bendava serkeftin û berxwedanê. Herkesek dizane ku bendava Tişrînê bendavek mezin û stratejîk e. Ger ev bendav teqîya di sedema êrîşên dewleta Tirk ya dagirker dê keresatekî mirovî a mezin bi xwere derbixîne holê. Her çiqasî QSD û Rêveberiya Xweser bangawazî kirin ku êrişên dagirkeriya Tirk yên li ser herêmê demildest bêsekinandin jî dîsa bi şêwazekê hovane ev êrîş berdewam dikin. Ev keraseta ku çêbibe ne tenê wê bandora xwe li ser axa Sûriyê bike, di heman demê de wê li ser Iraqê jî bandor bike. Di aliyê mezinahiya xwe de dikeve rêza dûyem a bendavên ji Sûriyê hene. Ev rastiya gel û şervanên QSD'ê jiyan dikin, dewleta Tirk hewildide vala derxîne. Hevalê me yên rojnamevan Nazim Daştan û Cîhan Bilgîn armanca siyaseta dewleta Tirk ya dagirker qutkirina dengê rastiyê bû. Îro jî heman siyaseta gefxwarin û zextê hewildide ku rastiya tê jiyan kirin bê bertek bihêle. Lê weke endamên Ragihandina Azad û rojnamevan buyerên herêmê ku berxwedaniya herêmê ji nêz ve dişopînin em dibêjin; 'Me kamira û pênûsa Nazim û Cîhanan hildaye û em rêça wan dişopînin, emê wê sozê bidin ku emê bi rihê Nazim û Cîhanan bibin dengê QSD'ê û YPJ'ê.'"

# Berxwedana Efrînê mohra xwe li dîroka mirovahiyê da

7 sal li ser êrişên dagirkeriya Tirkiyê ji herêma Efrînê warê zeytûnê re derbas bûn. Berxwedana Serdemê ya 58 rojan muhra xwe li dîroka berxwedaniya gelan xist. Ev têkoşîn tenê di Efrînê de nehat rawestandin bi îradeya gelê berxwedêr 7 sal ji koçberiyê li herêma Şehbayê li pey xwe hêla.

**Esma Mistefa/ Qamişlo**

Efrîna ku serjimariya wê zêdetirî 172.095 kes pêk tê û weke herêmeke Kurdî resen li Rojavayê Kurdistanê ye. Efrîn jî bi destpêkirina aloziya Sûriyê re serî li hember Rêjîma Sûriyê rakir û di xeta sêyemîn ya Tevgera Azadiya Kurdistanê de; Xweseriya Xwe ya demokratîk îlan kir. Li ser van bingehan bajarê Efrînê li kêlek destkeftî û zengînbûna xwe ya sererd û binerd bibû herêmeke herî bi ewle û ya pêşesaziyê ji hemû herêmên cîran re.

7'emîn Salvegera êrîşên dagirkeriya Tirkiyê li ser herêma Efrînê di 20'ê Çileyê de xwe nû dike. Faşîzma Tirkiyê bi pilaneke navnetewî di 20'ê Çileya 2018'an de bi amedekarîyeke mezin ji artêşa Tirkiyê û Çeteyên girêdayî wê; berê xwe dan Efrînê. Piştî berxwedaniya 58 rojan ku li hember hêza 2'emîn ya NATO yê li ber xwe dan, di 18'ê Adara 2018'an de Efrîn bi pilaneke navnetewî hate dagirkirin û serweriya xwe tê de îlan kirin.

Herêma Efrînê di giştî Sûriyê de yek ji herêmên herî berhemdar yê zeytûn û zeyta zeytûna ye. Ji derveyê wê herêmeke çiyeyî ye û bi ava xwe ya zêde û xwezaya xweşik tê naskirin. Bi derbasbûna dagirkeriyê û komên çeteyan re, li kêlek kiryarên dijmirovî yên ku di derheqê gelê wêyê resen de pêkanîne û hê jî didome, Efrîn ji her alî ve hate talankirin û di asta yekemîn de faşîzma Tirkiyê û komên çeteyan darên wê yên zeytûnan û bi deh hezaran dar, daristan, cihên dîrokî û şûnwarên wê talan kirin. Bi salvegera 7`emîn ya êrîşên dagirkeriya Tirkiyê li ser Efrînê Hevseroka Meclîsa Gelan ya Kantona Efrîn û Şehbayê Mûşîre Mele Reşîd ji rojnameya me re axivî.

### Efrîn yek ji pilanên avakirina pirojeya Rojhilata Navîn ya mezin bû

Mûşîre di destpêkê de Berxwedana gel ya li bendava Tişrînê silav lkir û hemû Şehîdên ku di oxira vê dozê de şehîd bûne bi bîr anîn. Herwiha bal kişand ser girîngiya Cografiya Efrînê û wiha pê de çû: "Em dizanin ku girîngiyeke mezin ya Efrînê di aliyê ciyostratejîk de heye, di pirojeya hegomoniyê ya dîzayînkirina Rojhilateke Navîn ya mezin her wiha riya heyanî deryayê, ji ber Efrîn jî weke deriyê deryayê tê naskirin, di milê din de jî li ser xeta sînor e. Ji bo pilanên xwe yên nû û demdirêj pêkbin diviya bû ku xeta sînor hemû bigihînin hev. Ji Bab, Ezaz û cerablisê destpêkirin. Lê belê tenê Efrîn û Til Rifet di wê navberê de mabû ew jî bi pilaneke dagirkirin. Daxwaza Tirkiyê û yên navnetewî ev bû ku xeta sînor weke ku hatiye pilankirin bigihînin hev, helbet ev yek jî dikeve xizmeta hegomoniya Gilobal ku pilana xwe ya Rojhilata Navîn ya mezin pêk bînin.

Bi rastî jî Efrîn gelekî zengîn e, çi di aliyê xwezayî de çi jî di aliyê cografîk de, her wiha ji bo derbaskirina xeta xazê xwedî erdekî pir alîkare. Di aliyê din de siyaseta ku hatiye meşandin, yek ji wê jî zengînbûna wê ya dîrokî û şûnwarên dîrokî yên ku xwe disipêrin bi milyonê salan. Efrîn weke dergûşa şaristaniyê dihate pênasekirin, li kêlek Efrînê Idlib heye di Idlibê de Dirgîş heye, li wir jî gelek gundên Kurdan hebûn, ev dihat wê wateyê ku Ev herêm dergûşa mirovahiyê di nava xwe de dihwîne. Bi taybet li Navçeya Şêrawa şînwarên Marmaron derketin. Bi van hemûyan re xwestin berê xwe bidin Efrînê û weke cihekî geştiyariyê jî bikarbînin û ji cewherê wê derxînin".

### Lihevkirin û bazar destwerdana Tirkiyê ji Sûriyê re rewa kirin

Mûşîre da zanîn ku di encama civînên Sotçî û Esîtana de Sûriyê hemû hate rûxandin û wiha got: "Em bixwazin hinek bêhtir vê dîrokê vekin, tiştê ku li Sûriyê hatiye jiyankirin û bi temamî sererd û binerda wê her wiha gelê wê hate talan û perîşankirin ev di encama civînên Sotçî û Esîtana bûn, her wiha ne ji demek dirêj ve di salên 90'î de dema lihevkirina Adana di navbera Sûriyê û Tirkiyê de hatiye avakirin, Ev îtîfaqiyet rewakirina ji civînên Sotçî û Esîtana re bûn ku Tikriyê bikaribe destwerdanê li Sûriyê bike. Destpêkê weke 5 km bû li gore lihevkirina Adana ya duyemîn 35 km bû. Bi giştî em dikarin bêjin ku Sûriyê ne piştî hatine HTŞ'ê hate rûxandin, ji dema lihevkirinan ve Sûriyê ji destê Rêjîma Essed derketibû. Aliyê herî sereke ku hişt Sûriyê hilweşe ew jî dagirkeriya Tirkiyê û Rûsiya bû".

### Armanc ji dagirkirina Efrînê

Mûşîre bal kişand ser armanca dagirkeriya Tirkiyê ji dagirkirina Efrînê re û wiha got: "Armancên dagirkeriya Tirkiyê ji bo dagirkirina Efrînê gelek bûn. Yek ji wan armacan modêla Xweseriya Demokratîk ya ku li wir hatibû avakirin, ya din yekîtiya gelan ya li ser hîmên aşîtî û wekheviyê jiyandikirin bibin bixîne. Ji ber hêdî hêdî Efrîn di aliyê pirengî, siyaset û hêza wê ya leşkerî û parastina cewherî de weke dewletekî biçûk teşe girtibû. Ya din jî dixwest ew komên çeteyan derbasî Trikiyê nebin, her wiha îrade û vîna gelan têk bibe û berjewendiyên xwe pêk bîne. Ev hemû bibûn aliyekî din ji armanckirina dagirkeriya Tirkiyê ji Efrînê re".

### Warê zeytûnê bû hembêza hemû gelan û pêkhateyan

Mûşîre di berdewamiya axaftina xwe de sekna gel bi avabûna Rêveberiya Xweser re anî ziman û wiha got: "Şoreşa ku li Sûriyê rabûye di 2011'an de ji cewherê xwe derket, lê di herêmên Kurdan de ev yek bi teşe û îdeolojiya herî guncav hate rûnişkandin û heyanî vê kêliyê jî berdewam e. Dema Rêveberiya Xweser di Efrînê de hate îlankirin, gel bi hemû pêkhateyên wê cihê xwe tê de girt û xwe di nav de birêxistin kirin. Di aliyê Leşkerî, siyasî, dîplomasî û civakî de xwe birêxistin kir. Ew rêxistinbûna ku hatiye avakirin di destpêkê de Meclîsa Rojavayê Kurdistanê 2011'an hat avakirin, destpêka 2012'an de jî Konferansa Avakirina Meclîsên herêmî hat avakirin, heyanî 2014'an gel di nava wan meclîsan de xwebirêxistin kir û bû bingeh ji avakirina Xweseriya Demokratîk di Efrînê de.

Dema Xweserî di Efrînê de hatiye îlankirin weke avakirina jiyaneke nû bû, bi def û zûrneyê rêveberî û gel meşiyan heyanî cihê şahiyê (Saha Azadî). Rûxmî ku ev şêwayê rêvebirinê modêlekî nû bû, lê gel karî bi hemû pêkhateyên xwe jiyana azad û wekhev pêk bîne. Bi hemdemiya wê re karî aboriya xwe avabike û gelekî xurt jî bû, dema ku Sûriyê di aliyê aborî de hildiweşiya Efrîn di pêşbirka aborî bi dewletan re bû. Bi rihetiya ku di aliyê jiyanî de hatibû avakirin, hêşt ku zihnê mirov jî rihet bibe. Aramî û aşîtiya ku hatibû teysandin herwiha dema Felsefeya Rêber APO êdî bû terzê jiyana gel di Efrînê de û bi pêş ket, bû metirsiya dijmin".

### Jinan Efrînê li hember guhartina zihniyetê têkoşîn kir

Mûşîre da zanîn ku di Efrînê de jin ola herî pêşeng leyêst û wiha domand: "Ya herî girîng jî avabûna sîstema hvserokatiyê di nava sîstema Rêvberiya Xweser de bû, jin bi vê yekê re xwe di hemû aliyên jiyanê de birêxistin kir. Sîstema ku rêber APO daya pêşkêşkirin, li hember zihniyeta sedhezar salan xwe birêxistinkirine û guhartina wê zihniyetê ye, bê guman ne zihniyeta kes guhartina zihniyeta civakê. Her çiqas şekil bê guhartin û xweşikkirin lê dema zihniyet weke xwe be, wê tu tişt neyê guhartin. Bi avabûna vê rêveberiyê re jî jin bû beşek girîng di hemû qadên civakê de û di sîstem, rêvebirin û civakê de rola pêşengtiyê hilda ser milên xwe. Hebûna jinê bi naskirina dîroka xwe re herwiha bi têkoşîna ku daye meşandin re, karî careke din derkeve meydanê û erkên xwe yên dîrokî pêk bîne. Jin di Efrînê de gihîşt asta ku êdî artêşan bi rêve bibe, bibe xwediyê qada perwerdehiyê û zanistê.

Jin di vê astê re bi cil û bergên xwe derbasî yek ji dewletên hegomonîk ku bûye sedema dagirkirina Kurdistanê Firanseyê bibe, hemû zagonên xwe binpêkirin û jina kurd bi rengê wê pêşwazîkirin. Dema êrişên li ser Efrînê destpêkirin jin beriya her kesî çek û rextên xwe li xwe kirin û cihê xwe di çeperên şer de girtin. Li kêlek zarokên xwe biryara ku bibin şervan û mertalên zindî dan. Ji çêkirin û belavkirina xwarina ku ji şervanên xwe re çêdikirin bigire heyanî eniyên şer li hember çekên herî pêşketî yên navnetewî şer kirin. Vê yekê jî em niha di kêliyên dîrokî yên ku jin di Bendava Tişrînê de dinivîse de dibînin".

### Hedefgirtina Efrînê Hedefgirtina Pirojeya Netewa Demokratîk bû

Mûşîre teqez kir ku asta Efrîn gihiştibûyê bû sedema êrîşên 20'ê Çile û wiha bilêv kir: "Efrîn bi ew asta ku gihiştibûyê, bû sedem ku di 20'ê Çile de 2018'an 72 balafir bi hevgirtina 72 dewletên navnetewî ku di nava peymanên Sûtçî, Esîtana û NATO de were êrîşkirin. Ew êriş berdewamiya kompiloya navnetewî ya li hember îradeya jina azad û felsefeya azadiyê bû. Di asta yekemîn de li hember pirojeya Netewa Demokratîk bû, ji ber dewletên navnetewî tunebûna xwe di nava pêşketina vê sîstemê de didîtin. Dewletên navnetewî bi sedsalan li pêş dinêrin, her tiştî ji bo mayîndebûna hebûn û berjewendiyên xwe pilan dikin. Ji ber vê jî didîtin ku wê bi vî rengî ewê hêdî hêdî tune bibin.

Dagirkeriya Tirkiyê bi hemû çûreyên çekên pêşketî û yên qedexekirî yên NATO'ê êrîşî Efrînê kir. Hemû pîvanên mafê mirovan binpêkirin û bi hezaran gel û zarok şehîd xistin. Bi sedan zarok di vî şerê bê wîjdan de hatin hedefgirtin û bi hezaran komkûjî pêka. Binesaziya herêmê û pêdiviyên gel armanc kirin da ku gel pê par bihêlin û goristanên Şehîdan jî hatin hedefgirtin. Bi vê kîn û nefretê Efrîn hate hedefgirtin. Lê li hember wê efsaneyên berxwedaniyê 58 rojan hate nivîsandin û cîhan tev jî bû şahidê vê yekê ".



### Ji Efrîn û Şehba ber bi Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve

Mûşîre di berdewamiya axaftina xwe de behsa qonaxa duyemîn ya berxwedana serdemê kir û wiha pê de çû: "Di berxwedana serdemê de armanca dagirkeriyê ew bû ku hemû gel di navenda Efrînê de kom bike û bi dubarekirina komkûjiya Helepçeyê careke din di çexsê gelê Efrînê de komkujiyeke nû bike, ev yek jî biryareke navnetewî bû. Ji ber vê yekê bi biryareke hevpar ya rêveberî û gel Efrîn hate valakirin û gel di 18'ê Adara 2018'an derbasî Şehbayê bû, rûxmî hemû êş û zehmetiyan jî kêliyên nû yên berxwedanê di qonaxa duyamîn a berxwedana serdemê de destpêkirin û 7 sal ji avakirina jiyaneke nû, berxwedan, têkoşîn, êrîşên dagirkeriya Tirkiyê û ambargoya Hikumeta Şamê li pey xwe hiştin û careke din bi geşedanên ku di giştî Sûriyê de hatine rûdan re, neçar man ku careke din koçber bibin û berê xwe dan herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê".

### Divê Kongireyek Netewî- Sûrî bê lidarxistin

Mûşîre di dawiya axaftina xwe de bang li raya navnetewî kir û wiha got: "Li beramber ewqas kiryar û sûcîn şer herwiha li hember tunekirina dagirkeirya Tirkiyê di Efrînê de, Banga me ji hêzên navnetewî û Neteweyên Yekbûyî re heye. Em dibêjin di nava  geşedanên ku li Sûriyê têne jiyankirin û li hember êrîşên heyî û kiryarên ku têne kirin pêwîste ku hemû alî bibin xwedî helwest, da ku em bigihêjin çareseriyekê ji bo hemû Sûriyê. Her wiha kongireyekî Netewî-Sûrî bê lidarxistin û destûrekî hevbeş di Sûriyê re were avakirin da ku Sûriyeke demokratîk, aşîtî û nenavendî were avakirin".



# Çarenûs çawa diyar dibe?

**Ramazan Olçen**



Hevsengiya piştî Şerê Yekemîn yê Cîhanê hatiye danîn diherife, dirûxe. Herkes vê jî dipejirîn e. Ne tenê li Rojhilata Navîn li cîhanê tevahî proseseke bi vî rengî dest pê kiriye. Li Ewrûpa, Amerîka, Asya-Pasîfîk, Afrîka û helbet li Rojhilata Navîn. Ji ber ku guherîn û veguherînên li Rojhilata Navîn rasterast bandorê li me dike, bala zêdetir li herêma me ye. Piştî şerê yekê dîzayna li Rojhiata Navîn êdî nabe ku weke xwe bimîne. Statukoya ku piştî şer hatiye danîn êdî ji her alî ve riziya ye, ji hev de dikeve. Melûm e, piştî şer nexşeya Rojhilata Navîn bi peymana Sykes-Pîcot hat xêzkirin. Li gorî berjewendiyên hêzên hegemon ên wê demê Îngilistan û Fransa ev nexşe xêz kirin.

Bi Sykes-Pîcotê li Rojhilata Navîn jî prosesa netewe-dewletan dest pê kir. Di vê prosesê de ji ber parçebûna Kurdan, ji ber nebûna rêxistin û bîrdoziyeke wan ha hevpar, nebûna tevgereke  ku Kurdan hemûyî hembêz bike, Kurd bû statu man. Ketin ber penca qirkirinê. Ev bi Peymana Lozanê êdî hat fermîkirin. Hêzên cîhanî yên serdest Kurdan kirin qurbaniyê 'aşitiya xwe'. Aştiya wan bû şer, bû êş û azar ji bo gelê Kurd.

Niha îro roj ew hevsengî, ew qedera bixwîn dike biguhere. Dîsa dîzayna herêmê di rojeva hêzên cîhanî de ye. Dîsa ew ê li berjewendiyên xwe bigerin û bipirsin. Lê ji bo Kurdan mirov dikare bibêje ku êdî deriyekî felatê dike vebibe. Bi saya feraset û keda Rêber Apo Kurd li rojhilata Navîn bûne hêzeke mezin e. Xwedan bîrdoziyeke welê ne ku bandore li gelên cîhanê giş dikin. Dirûşma felsefeya Jin Jiyan Azadî li ser zar û zimanê jinên cîhanê tevahiye. Paradîgmaya Neteweya Demokratîk ku xwe disperse demokrasiya radîkal, ekolojî û azadiya jinê li akademiyan, li platformên cuda, di nav komelgehan de tê nîqaşkirin. Li Rojavayê Kurdistanê ev paradigm bi gewde bûye. Navê Şoreşa Jinê ya Rojava li cîhanê olan dide. Kurd bi rêxistiniya xwe ya jî nîşan didin ku daxwazê ne tenê ji xwe re ji hemû gelan re dike. Ev li Rojhilata Navîn û cîhanê di vî demê de tekane minak e.

Niha madem rewş bi vî rengî ye, madem Kurd gaveke din bavêjin wê azadiyê bi dest bixin, çima ewqas dilê me çargopal lê dide? Çima destê me lis er dilê me ye, fikar û tirsên me hene. Helbest sedemên vê hene û ev sedem jî ji bo tedbîrgirtinê divê hebin. Erê rast e, Kurd xwedan bîrdozî, rêxistin û Rêbertî ne. Lê di heman demê de siyaseta Kurdî hîn ji bo destnîşankirina çarenûsê bi awayekî yekrêz û yekhewest tevnagere. Ev dibe sedem ku dijmin û neyarên Kurdan ji xwe re hisaban bikin. Ev dibe sedem ku li ser Rojava bombe bikarînin. Ev dibe sedem ku pişta milletê Kurd êriş li gerîlayên azadiyê bê kirin. Ev dibe sedem ku Rêber Apo ev 26 sal in di pergala qirkirinê de bê girtin.

Di vî demî de reş û spî eyan û beyan bûye. Kes dikare fetlê bide xwe û xwe bizivirîne. Yek bi yek hemû Kurd, tevî pêkhayetên li Rojhilata Navîn di dûryaneke  dîrokê de ne ku îcar dikarin qedera xwe bi destê xwe binîvîsin. Wêneyên sedsala bihurî li ber çavê me ye û her roj sûretên nû li vê wênêyê mezin dibe. Êş û azar dewam dikin. Pêwîst e, em hemû qerara xwe bidin. Heke biryara me azadî be, heke biryara me jiyana bi nasname, çand û zimanê xwemalî be hingê erk û berpirsyariyên me hemûyan hene.

Gava yekem dive em dest bidin hev, mil bidin têkoşîna azadiyê, têkoşînê mezin bikin û dawî li şerma 26 salan a pergala qirkirinê ya Îmraliyê bînin. Heke Rêber Apo ji wê pergalê bê derxistin hinge, em ê bikaribin bi layiqî bi serbilindî bibêjin ku em azadiyê, aştiyê, demokrasiyê dixwazin. Lê heke em bêrûmetiya, şerma ku bi pergala qirkirinê li me tê ferzkirin qebûl bikin, hinge daxwaza me ya azadî û aştiyê jî wê xwe xapandin be.

## Divê di yêkîtiya netewî de bê israr kirin



**Zekî Bedran**

Di hevdîtina li navbera serokê KDP'ê Mesûd Barzanî û Mazlum Ebdî de şanaziyekî xurt di nav kurdan de da avakirin. Weke pêngavekî ku ji bona yêkrêziya neteweyî hat dîtin û şîrovekirin. Ji xwe ev teqeze ku gelê kurd ji bona yekrêzî û yekîtiyê di nav xwestekekî mezin deye. Rewşenbîr, hunermend, derdorên siyasî û herî girîng jî gel bendewariyekî mezin ji bona yekrêzîyê digire. Ji ber wê yekê ye, ev hevdîtina di navbera Mazlûm û Barzanî de bi keyfxweşî hat pêşwazî kirin. Hevdîtin û serlidanên di navbera hêzên siyasî û leşkerî yên kurdî de, pêngavên girîngin dibe armanca van yekrêzî û yekîtî be. Ev hevdîtinên wisa pir xwezayi ne û nebûna wan kiryarên balkêşin. Hema bêjin her roj di zimanê me hemûyan de heye ku em dibêjin "Kurd ne kurdên berê ne, kurd hatine rêxistin kirin û xwe perwerde kirine." Gelê Kurd bi ezmûnên dîrokî jî, wate û giringîya yekrêziyê baş dizane û fêm dike. Dibêje hemû lêgerîn û têkoşîna wî ji ber nebûna yekîtiyê têk çûye. Pirsgirêka yekîtiyê ji bo kesên ku bi têkoşînê re eleqedar dibin û xwedî hişmendiya dîrokî ya hindik in êşek hevpar e. Tê zanîn ku nebûna yekîtiyê her tim dibe sedema windakirinê. Kurdekî ku vê nebêje ne gengaze ku hebe.

Ev teqeze ku dijminê me, heznake kurd bibin yek. Hewildanê dagirkeran herdem li ser dabeşkirin û ne yekrêziya wan e. Ji tê mîsogerkirin jî dîrokê de ev kiryar hertim pêkanîn e. Cûdahiyên weke malbat, eşîr û olî bikaranîne nehiştine  di gelê kurd de yekrêzî û yekîtiyê ava bikin û herdem astengî dana avakirin. Ev tê zanîn ku bi hevre hêz ava dibe. Dijmin jî nakokiyên hindirîn yên ku di navbera Kurdan de agahdar bibû û her kurd bi kurda dida şikandin.

Demên berê Kurd evqasî nehatibûn perwerde kirin û bi rêxistinkirin. Ti demên dîrokî evqas kadroyên xwe yên siyasî ne avakiribûn. Ev qas partî û rêxistin ne hatibûn damezirandin. Her çar parçeyên Kurdistanê jî, bi hevre qut û ne hevpar bûn. Her beş jî, di navbera xwe de jî, hatibû dabeşkirin. Herêm di navbera xwe di rêjeyek mezin tecrîd jiyan dikirin. Hemû serhildanên ku hatin destpêkirin heremî mane û xwe nekarîne bighêjine asta neteweyî. Lê ev rewş niha pir cuda ye, êdî her çar parçeyên Kurdistanê hevdû bandor dikin û agahdarin. Peywendîyên van bi hevre di asta jor dene. Bi hejmarek zêde xwedî dezgehên ragihandin û çapemeniyê ne. Xwediyên xebatê ragihandinê yên têr û dagirtîne.  Ji ber wê yekê em dibêjin Kurd ne kurdên berê ne.

Me nebûna yekîtiya xwe demên berê bi sedemên wekî eşîret, berjewendiyên malbatî û nezaniyê rave dikir. Niha ev hincet bi giranî ji holê rabûne. Gel hişyar e û yekîtiyê dixwaze. Tenê naxwaze, ferz dike û israr dike. Di gel vê yekê, nebûna yekîtiyê çawa dikare were ravekirin? Helbet dîsa bi berjewendiyên malbatî, hizbî û hikûmetê dihate pênasekirin. Bi têkiliyên bi dijmin re û polîtîkayên hevkariyê re. Ji ber vê yekê niha nebûna yek ne ji nezaniyê ye, niha hilbijartinek bi zanebûn heye. Di vî warî de gel kesên ku neyên yekîtiyê rexne dike û şermezar dike.

Sedema ku em vê rastiya dîrokî vedibêjin ew e ku em nas bikin ka çima hevdîtina Barzanî û Mazlûm wiha balkişand. Lê divê rêxistinên kurdan her tim bi hev re bicivin, hevkarî bikin û piştgiriyê bidin hev. Çima tiştek bi wiha asayî di nav me de eleqe û kelecanê çêdike? Her wiha di vê hevdîtinê de ne aliyên Kurdî lihevkirine, yekîtî û hevparî jî pêk nehatiye. Her wiha bi salan e ji bo yekîtiya neteweyî xebat tên meşandin û gelek civîn û komxebat jî hatin lidarxistin. Lê divê raya giştî û derdorên siyasî zêdetir bipirsin ka çima tevî van lêgerînan yekîtî pêk nayê?

Beriya niha bi salan li Hewlerê ji bo yekîtiya neteweyî civînên xurt hatin lidarxistin. Hemû Kurdistanê digot, "Ev qediya, vê carê yekîtî pêk tê". Rêber Apo ji bo serokatiya kongreya netewî jî pêşniyara Mesûd Barzanî kir. Lê Barzanî ev kar berbelav kir û maseya yekîtiyê hilweşand. Sedem jî ew bû ku Leyla Zana wek hevserokê wî hat pêşniyarkirin. Bi gotina, "Hevserokatî pergala PKK'ê ye, ez wê yekê napejirînim û tevlî jî nabim" Ji bo yekîtiyê ne hewce ye ku partî û rêxistin xwe hilweşînin û bernameyên xwe biguherînin. Yekîtî bi parastina cudahiyên di nava pirdengiya demokratîk de pêk tê. Ji hev fêmkirin bes e. Ji bo bidestxistina armanceke mezin a weke yekîtiya neteweyî pêwîste her kes gav biavêje û xwe nêzî hev bike. Ji bo yekîtiyê ne hewce ye ku partî rêxistinên xwe hilweşînin û bernameyên xwe biguherînin. Yekîtî bi parastina cudahiyên di nava pirdengîya demokratîk de pêk tê. Ji hev fêmkirin bes e. Ji bo bidestxistina armanceke mezin a weke yekîtiya neteweyî pêwîste her kes xwedî li hev derkeve û xwe nêzî hev bike. Ya girîng ew e ku li ser xalên bingehîn li hev bikin. Bi rastî, her perçeyek xwe birêve dibe. Hemû partî kar û xebatên xwe tevî hemû astengiyan didomînin. Di vî warî de, tu kes ne girêdayî kesekî din e.

Di van salên dawî de Barzanî ti beşdarî xebatên yekîtiyê nekiriye. Li derveyî hemû nîqaşan û goftûgoyan man. Li dijî Rojava ewqas êrîş hatin kirin, heta ku ji destê wan hat dûr man û polîtîkayên xwe li ser  wek alîgir û piştevanê dewleta Tirk a dagirker dan meşandin. Rojekê jî êşa gelê Rojava parve nekirin, sersaxî jî ne xwestin. ENKS'ê ku girêdayî wan bû, bi tevahî di bin sîwana Tirkiyê de siyaset kirin. Piştî ku rejîma Baas hilweşiya jî, di nava hevpeymana bi navê SMO ya ku êrîşî Rojava kir de cih girtin. Tevî daxwazên gel û welatên rojavayî jî bi israr xwestin ku cuda biçin Şamê. Gel êdî hêviya xwe ji yekîtiyê winda kiribû. Di rewşeke wiha de hevdîtina Barzanî û Mazlûm pêk hat. Ji ber vê yekê jî hevdîtin gelekî bal kişand Pêwîste her pêngava ku ber bi yekîtiyê ve tê avêtin, were piştgirî kirin. Zivirandina ji her zirarê serkeftine. Eger hevdîtina Barzanî û Mazlûm deriyên yekîtiyê veke, ev dê bibe pêşketineke baş. Em hêvîdar in ku di wî warî de pêşketin çêbibin. Lê hê rêyeke dûr û dirêj heye. Di vî warî de divê em pirsgirêkan çareser nebînin. Divê derdorên hestiyar piştgiriya yekîtiyê bidomînin û giraniya xwe bidin pişt.



## Bavê Teyar: "Em ji we natirsin"

**Farûk Sakik**

Her tişt di sla 1991'ê de dema Sedam berê artêşa xwe da Kuweytê dest pê kir. Dewletên ku heta wê rojê komkujiya Helepce, Enfal û hovîtiya Sedam di bin bêdengiyê de temaşe kiribûn, dagirkirina Kuweytê ji bo mirovahiyê talûke dîtin û berê xwe dan Iraqê. Dema ku hatin Iraqê Şerê Sêyem ê Cîhanê êdî dest pê kiribû.

Bi salan re gelek eniyên şer çêdibûn. Li deverek hên şer bi dawî nebûbû li deverek din dest pê dikir. Di sala 2011'an de ev şer derbasî eniya Sûrî bû. Herkesî û her hêzê berê xwe da Şamê, lê dewleta Tirk a dagirker berê xwe da hêrêma Kurdan. Bi DAIŞ'ê û hin hêzên din encam negirtibû. Di sala 2018'an de di 20'ê Çileyê de bi artêşa xwe, bi balafir û çekên xwe berê xwe da Efrînê.

Li Efrînê berxwedanek ku wê 57 roj dewam bike dest pê kir. Lê komkujî û êrişên li dijî sivîlan derket radeyek wisa ku Meclisa Efrînê neçar ma biryara terkirina bajêr da. Hatin li Şehbayê bi cîh bûn. Bi hêviyên ku wê rojek vegerin Efrînê têdikoşiyan. Di vê pêvajoyê de, di Şerê Sêyem ê Cîhanê de eniyek nû vebû. Di dawiya sala 2024'an de HTŞ'ê ji Îdlibê bi rê ket li ser Helebê de derbasî Şamê bû û li wê derê bu desthilat. Dewleta Tirk jî parçeyek vê planê bû. Sozê ku li Astana dabû; wê çeteyan li Îdlibê di bin kontrolê de bihêle, dabû aliyekê, di şevekê de Îran, Rûsya û Beşar Esad firotibû. Ev hêz ji herêmê kişiyan bûn û HTŞ bê midaxele hatibû Şamê. Tirkiye parçeyek vê planê bûyina xwe bi fotografê Îbrahîm Kalin ê li Şamê li gel Colanî îtiraf dikir.

Çawa ku di sala 2011'an de hemû hêzan berê xwe da Şamê lê wan jî berê xwe dabû herêma Kurdan, evcar jî  heman tişt kirin. Herkes ber bi Şamê bi rê ketibûn, lê wan berê xwe dane Şehba û li Til Rifatê. Metirsiyek komkujiyên mezin ji bo koçberan hebû. Ji bo vê yekê  koçberên Efrînê derbasî heremên bi ewle kirin. Lê dewleta Tirkiyê ya dagirker bi vê yekê jî qaîl nebû, berê xwe da Minbicê. Li ser Minbicê li hevkirinek çêbû.  Dema ku li Şamê statuyek hên zelal nebûbû wan xwest derbasî rojhilatê Firatê bibin.

Li bendava Tişrînê eniyek şer a nû hebû. Dewleta Tirk bi hêz û çeteyên xwe bi hovîtiyek mezin êriş dikirin. Di vê pêvajoyê de li vêderê berxwedaneke dîrokî dest pê kir. Şervanên, QSD, YPG û YPJ'ê bi darbeyên giran bersiv didan van êrişan. Piştî ku dewleta Tirk a dagirker, ev berxwedan dît, hêz û leşkerên xwe, da alî û çete da pêş. Di demek wiha de vegeriyan û ji nû de pêvajoya bi Rêber Apo re dabûn destpêkirin-seknandin, ji nû de xistin meriyetê. Heyet şandin Îmraliyê.

Di nav raya giştî ya cîhanê de ev berxwedan dengek mezin vedabû. Herkesî behsa mafdarî û lehengiya Kurdan dikir. Lê mixabin bi tenê daxuyanî. Tu kesî midaxle nedikir. Dema ku di qada navnetewî de midaxle nahat kirin. li Tişrînê berxwedan derbasî merheleyek nû bû. Gel-sivîl bi rihê şerê şoreşgerî berê xwe dane Bendava Tişrînê. Li kêleka şervanan dest bi nobeda berxwedanê kirin. Di 17'ê Çile de me dît hunermend-şanoger Bavê Teyar û kurê xwe jî li ser bendava Tişrînê, tevlî vê berxwedanê bûne. Bavê Teyar li vê derê şanoya xwe ya dawî ya bi nave 'Lawo, welle em ji we natirsin' lîst û di encama erîşên dewleta Tirk a dagirker de şehîd bû.